



ŞAREDARÎYA BAJARÊ MEZIN A AMEDÊ



BAJAR

ÎLON 2026






## QEHRAMAN LÊ NETEWEPERWER




## KEKO

KEKO, ÇETO Û GERMA CEHENEMÊ




## ZAROKÊN MEMRÛD

KA KÎ YE EV?

## HÎPOKRAT

## DEDEKTÎFÊ KUÇEYÊN TENG ZILKÎF










# QIRIX


Doğan Güzel


KEKO
KEKO, ÇETO Û GERMA CEHENEMÊ
NA ÇETO, NAKEVE SERÊ MIN. HEYATA AXRETÊ YA BÊDAWÎ... YANÎ ÇAWA? HETA HETA?... ŞÛN DE TU LI GOTINÊN WÎ, PEYVÊN WÎ MÊZE DIKÎ Û TU DIBÊJÎ QEY EYNÎ ZEÛS... ZEÛSEKÎ MODERN. HA HO, KA EW MESELEYA HURÎYAN JÎ HEYE YA...
TEVÎ TE DIBIM KEKO
EW DAÎŞ RADIBE DAWEYA KOLETÎYÊ Û CARÎYETÎYÊ DIKE, LÊ EV MISILMANÊN ME TENÊ DIBÊJIN NA, VAN KITÊB ŞAŞ XWENDIYE Û NIZANIM ÇI... TU DIBÊJÎ QEY EV 'ÎNQLAP TARÎXÎ' YE Û EM Ê PAŞÊ RABIN BIBÊJIN NA ÊDÎ QEBÛL NABE... TU ÇI DIFIKIRÎ APÊ SALIH, EV DAÎŞ ŞAŞ DIXWÎNE YAN HÛN BI EREBÎ NIZANIN?
EHM... XWEDÊ BELAYA WAN NETEWEPERESTAN BIDE. QURANÊ JI XWE RE DIKIN HÎLE. EHM... YANÎ EZ WISA DIFIKRIM...
MA NE WISA, XALÊ ZILKÎF? KÎJAN HIKÛMET BÛYA NIHA JI ZÛ DE TÊK ÇÛBÛ, LÊ JI BER KU DAWEYA MISILMANTÎYÊ DIKE MILET WAN QEBÛL DIKE. DIZ BE JÎ DIZÊ WE YE, NE?.. JIXWE DÎN Û ÎMAN GIŞT BÛYE PERE...
HAHO, QAŞO EZ BÛM WELATPARÊZ JÎ JI VAN KURDÇÎYAN PAK NEBÛM.
...JI BER KU XWE XWEDÎYÊ ÎSLAMÊ DIBÎNIN HEWCEYA WAN A BI EXLAQ JÎ ÊDÎ TUNE YE. MAŞELAH HER TIŞT TENÊ JI WAN RE SERBEST E. JIXWE DÎNÊ XWE KIRINE WEK LASTÎK. ÇI BIXWAZIN KARIN BIXIN HUNDIR, LÊ EXLAQÊ BAŞ NAKEVÊ... MA NE ŞERM E EM LI DÛ VÊ SÎSTEMÊ HERIN Û LI MALA XWEDÊ LI PROPAGANDAYA DEWLETÊ GUDARÎ BIKIN?
EHM, KURÊ MIN TU JÎ RAST Î, LÊÊÊ...
BES, XELAS... HETA NIHA MIN WE ÎDARE KIR LÊ ÊDÎ MECBÛR MAM VÊ BIKIM. ÊDÎ HÛN Û AGIRÊ CIHENEMÊ.. Ê DE KEREM KIN...
ÇIK!
ÇAWA?!.
TE DÎT ZALIM ÇAWA QLÎMA GIRT. ME GOT KA LI MALA XWEDÊ EM PIÇEK XWE HÊNIK BIKIN Û BI HEVALÊN XWE YÊ QEHWEYÊ RE MIHEBET BIKIN, LÊ EV BEKÇÎYÊ SÎSTEMÊ... TU DIBÊJÎ ÇI YANÎ MELE, DEMA BIKEVIM CAMÎYÊ ÎRADE Û FIKIRÊN XWE LI DERVE BIHÊLIM?
DERVE MÎNA CEHENEM, LI HUNDIR JÎ SÎSTEMA TCYÊ... XWEDÊ, ÊDÎ BES E LOOO!
EGER WERIN Û JI XWE RE KÊFA QLÎMAYÊ BIKIN MESELE TUNE... LÊ DEMA DIKEVIN CAMÎYÊ EV CIWANÊN KURTÇÎ DIBIN WEK FÎLOZOF. BILA LI MALA XWE, LI NAV CIHAN BIKEVIN FIKIRÊN KÛR Û DÛR HEYRAN. LI VIR EHLAQÊ CEMAETA MIN XERA DIBE
LO LO MELE, ÎCAR EV ÇI BÛ ÛLA?! WA MIN JI TE RE GOT; YA TU QLÎMAYÊ VEKÎ YAN JÎ EM Ê TEV TERKA CAMÎYA TE BIKIN. JIXWE CEMAETA TE KÊM E...
MEAŞÊ TE BI RAYÊN XWE EZ DIDIM ÛLA. ZÛÛÛ!...



KÛTO
ZEMANÊN NÛ, DERDÊN KEVN
KEREM KE CANO, JI TELEBÊ ME RE ÇAYEKE QAÇAX Û TEZE... BILA QAFÊ XWARZÎYÊ MIN BAŞ BIŞIXULE Û BI ÎZNA XWEDÊ UNÎVERSÎTEYEKE BAŞ QEZENC BIKE. LÊ WEXTA BIBÎ MIHENDIS TU YÊ DEV JI ME BERDÎ Û HERÎ WAN 'CAFE'YÊN BIHA YÊ EHMEQAN LÊ DÎSA JÎ MESELE NÎN E. HÎ-HÎ!..
WÎÎÎ, HAYA ME JI TE NEBÛ Û EM HATIN OKEYA XWE LI BIN GUHÊN TE DANÎ. KA EM PIÇEK BI ŞÛN DE HERIN BILA CANO DERSA XWE REHET BIŞIXULE
EM LI VIR MAN, LÊ QENE EV GÊNC BILA XWE XELAS BIKE...
EHM, ESTEFILAH KEKÊ MIN!
HEY BURJÛVAYÊ BIÇÛK, HÎN TESELÎYA TE NE KETÎ KU TU SIBEH ÊVAR JI BO UNÎVERSÎTEYÊ DIXEBITÎ? ÇI?.. TU YÊ BIBÎ MAMOSTA Û ZAROKÊN KURDAN ASÎMÎLE BIKÎ YAN BIBÎ MIHENDIS, LI DÛ SÎYASETÇÎYÊN AKPYÊ BIGERÎ JI BO ÎHALEYAN?
KÛTO ?!..
DAWÎ PÊNC-ŞEŞ SAL UNÎVERSÎTE, PÊNC-ŞEŞ SALÊN DIN JÎ QPS... XWEDÊ ZANE GEREK ÇEND SAL JÎ KAR BIKÎ JI BO BIBÎ XWEDÎ XANÎYEKÎ ŞEŞ ODE U EREBEYEKE JI MODELA DAWÎ... KA KURD U KURDISTAN LI KU DERÊ VÊ PLANÊ DE YE CANO? JI NEWROZÊ HETA NEWROZÊ?
...EV KURDÊN SISTOPISTO JÎ VÊ SURECA AŞTÎYÊ JI XWE RE DIKIN MANE Û DIXWAZIN DI NAV SÎSTEMÊ DE JI XWE RE CIH BIBÎNIN... TU DIBÊJÎ QEY KES LI ÇIYÊ NEMAYE Û EV DEWLETÊN MANYAK HÎN NE LI SER ME NE... EV ÇI HALÊ KURDAN E, EV ÇI ADETÊN NÛ NE DERKETINE!... NEFRET DIKIM!
HER KES XWE JI BO ZEMANÊN NÛ HAZIR DIKE LÊ EV KÛTO... ECÊB JI BO ÇI LI DIJÎ GUHARTINÊ EW QAS LI BER XWE DIDE? EW QAS RADÎQAL, EW QAS SEKTER... NIÇ, SURECA NÛ QET LI HEVALÊ ME NEHAT...
NA, EZ QEBÛL NAAAKIM!..
KA DE ÎCAR WERE QADA LEGAL ÎNKAR BIKE KURÊ KERÊ! LI GORA PARTÎ Û SEROKÊ TE GEREK VÊ QADÊ VALA NEHÊLÎ. LÊ TU YÊ BI VAN NOTÊN ZEYÎF ÇAWA MÎSYONA XWE BI CIH BÎNÎ HEVAL?.. ÇAWA LI RÛYÊ QOMTANÊN XWE MÊZE BIKÎ? KU ABÊ SÎYASÎ WERE EZ Ê BÊJIM HEVALÊ KÛTO DERS NAŞIXULE
MIN DERSA XWE QEDAND Û ÇÛM HEMÛ FRAQ ŞÛŞTIN Û HATIM LÊ EV MÊRO HÎN LI EYNÎ PELÎ YE. KER E YAW!...
ŞŞŞT, BELA XWE LI LAWÊ MIN NEDIN. ZEMANÊN NÛ, ADETÊN NÛ... MERIV HÊDÎ HÊDÎ HÎN DIBE. KA HERIM JI KURÊ XWE RE ÇAYEKE QAÇAX ÇÊKIM, BILA QAFÊ WÎ BAŞ BIŞIXULE
NEFRET DIKIM! JI DERSÊ NEFRET DIKIM!...


KEKO
QUMARA HERAM Û QUMARA NE HERAM
LAWO, SEDOYÊ PÎÇ, TU FEDÎ NAKÎ VÎ GENCÊ ME DIBÎ DIXÎ NAV TÊKÎLÎYEN XWE YÊ BEHS Û QUMARÊ ÛLA! ZANÎ XWEDÎ KAR Û MEAŞ E, JI BER VÊ ÇAVÊ TE WÎ BIRÎ, NE?... KU TU CAREKE DIN WXE NÊZIKÎ WÎ BIKÎ HEYE YA, SOND BI NAVÊ XWEDÊ EZ Ê VÊ SATORÊÊÊ...
E..EFÛ BIKE KEKO. TOBE HERAM KEKO...
SA.. SATOR !..
TU LI VIR BÎRA DIFIROŞÎ YAN MILET SERXWEŞ DIKÎ Û DAWÎ DIELIMINÎ QUMARÊ!. EGER CAREKE DIN LI VIR QEREBALIXA QUMARÊ BIBÎNIM HEYE YA!..
HIJDÎNA LÊ BIXE BILA DENG HERE ESNAFÊN DIN. MEQSED MESAJ...
ŞEEEQ!
ÛLA BÊNAMÛSÊ MEZIN, QUMAR Û BEHS NE BE KÎ BI VAN ŞERTAN JI TE DEYN DIGIRE ÛLA! PÊŞÎ GÊNCAN DIELIMÎNIN VAN TIŞTAN PAŞÊ JÎ DEYNÊN HERAM DIDIN. EW BI QUMARÊ DILÎZIN LÊ TU QEZENC DIKÎ, NE!.. BÊNAMÛS!
HAHO BISMÎLA!
MESELEYA DEYN JÎ ÇÊBÛ. PEREYÊ EWILÎ LI SER DOLAR VEDIGERÎNÎ, TEMAM? JI VÊ BI ŞÛN DE NE DEYN, NE QUMAR NE ŞÎKAYETA XALTÎ DIXWAZIM. TE FAM KIR RIZGO? JI NEHA BI ŞÛN DEEE...
SOZ KEKO... EHM!... SOZÊ XWEDÊ
TU DIBÊJÎ ÇI ÇETO, ME QEZENC KIR YA?...
BAHS E EV KEKO, BELÎ NABIN EV TIŞT. LÊ RIZGO MESAJ GIRT. ŞANSÊ ME HEYE YANÎ
XWEDÊ JI TE RAZÎ BE KEKO. RIZGOYÊ MIN LI ŞÎRETÊN TE GUDARÎ DIKE. MEHEK E DEV JI OYINAN BERDAYE KURÊ MIN. NE YÊ KUÇÊ NE JÎ TELEFONÊ... EV MEH MEAŞÊ XWE JÎ ANÎ MALÊ, BI XÊRA TE.
ÇAVÊ ME RONÎ XALTÎ!
KEREM KE ÇETO, KEKO EV PERE HEQ KIR. GOT EW Ê DI HEFTEYEKÊ DE RIZGO JI QUMARÊ DÛR BIXE Û KIR. WEXTA KEKO DIKEVE ŞERTÊ HER TIM QEZENC DIKE YAW.
LI SER DEVJÊBERDANA BEHS Û QUMARÊ MERIV DIKEVE BEHSÊ GELO?... LI GORÎ MIN XWEDÊ EV TIŞT WEK XÊR QEBÛL NAKE. Û VÎ KEKOYÎ RABÛ EM JÎ KIRIN ORTAXÊ GUNEHÊ XWE.
ÛLA QUMARBAZ, ÇI JI TE JI ÎŞÊ XWEDÊ. KA TU PEREYÊ ME BIDE. QUMARBAZÊ HERÎ XERAB EW E KU NIZANE WINDA BIKE... ME Û XALTÎ Û RIZGO QEZENC KIR, TE WINDA... QUMARA HELAL
ERÊ WELE, EW QAS ZEMAN E DI BEHSÊ DE PERE WINDA DIKIM, EV CARA EWILÎ YE KU EV NAYÊ BER ÇAVÊ MIN. BILA KEKO ROJEKÊ LI MIN JÎ ŞÎRETAN BIKE YAW

Mam Cici nivîsî



## KA KÎYE EV




# HÎPOKRAT

(B.Z. 460 - B.Z. 370)

*Hekîmê îyonî ye ku wekî avakerê tiba zanistî tê nasîn. Em Hîpokrat bi rêz bi bîr tînin, ku gava di serdemeke wisa de xelkê bawer dikir nexweşî ji ber xezeba xwedawendan çêdibin, wî dibistana tiba zanistî ava kir.*
*Ev dibistana ku wî li Girava Kosê ava kiribû, bû yek ji giringtirîn navendên tibê yên Serdema Antîk. Berî Hîpokrat, hekîman bi navê Asklepyos sond dixwar ku ew wek xwedawendê tibê dihat qebûlkirin. Hîpokrat ev yek guherand; pêşî got "etîk" û metna sonda Hîpokrat nivîsî. Di wê serdemê de êdî bê hekîmîyeke çawan hebe, vî zilamî ferz dît ku hinek rêzikên etîkê deyne.*


*Li gorî Hîpokrat, rêzika serê pêşîn a tibê ew prensîp e ku dibêje "pêşî zerarê nedê!" Diyar e ku ew hinekî zêde rastî wan bijîşkan hatiye ku eyarê destê wan tune ye. Henek li aliyekî, sonda Hîpokratî metneke wisan e ku nirxê xwe winda nake û divê hîn jî bê rojaneyîkirin.*




ÇAY BAŞ E, TÎBÛNÊ DIŞIKÎNE, XWÎNÊ RON DIKE. HER ROJ TEQEZ SÊ QEDEH ÇAYA XWE VEDIXWIM. HUUULPP!...
ÎCAR EW CAMÊRÊ KU JÊ RE DIBÊJIN DAMEZIRÎNERÊ TIBA ZANISTÎ EV E?
HÎPOKRAT BELA MIN BIDE KU MIN DERMANÊN XWE NEXWARINE BAVO!
EW NE TIŞTEKÎ WEHA YE KURÊ MIN!
SONDA HÎPOKRATÎ JI BO DOKTORAN E. YANÎ SONDEKE MESLEKÎ YE.
KA BISEKINE, EZ Ê JI PIRTÛKXANEYA XWE KÎTÊBEKÊ BÎNIM Û BÊM. DIVÊ TU HÎN BIBÎ BÊ KA EV HÎPOKRAT KÎ YE.
UFFF, MIN JÎ DÎGOT QEY JI MEKTEBÊ XELAS BÛM
Hîpokrat ku bi navê bavê tibê tê zanîn, b.z. di sala 460î de li Îstankoyê ji dayik bû.
ELEQEYA WÎ BI STANBOLÊ TUNE YE.. EV LI DERYAYA EGEYÊ GIRAVEK E (GIRAVA KOSÊ) HEVALINO
Dersa tibê li ber destê bavê xwe Heraklîdes hîn bû. Wê demê hekîmî ji bav derbasî kur dibû. Lê bêguman her kes nikare bi qasî bavê xwe jêhatî be.
HEKÎM BEG, KURÊ WE JI DARÊ KET!
NIÇ, JI VÎ ÊDÎ TU HEKÎM ÇÊNABE. KA EM VÎ BIKIN MIDUR
Wê demê bawerî ew bû ku nexweşî ji xezeba xwedawendan tê.
NIHA TU DIÇÎ JI BO XWEDAWENDAN QURBANÊ ŞERJÊ DIKÎ Û PARA MIN JÎ TÎNÎ. MIN FAM KIR?
NIZANIM. LÊ DIZANIM KU EZ Ê TÊRA XWE GOŞT BIXWIM
HIH UHIH! GAVA EM QURBANÊ ŞERJÊ BIKIN, EZ Ê BAŞ BIBIM DOKTOR BEG?
EXXXE OXO!
Hîpokrat, hekîmê pêşîn e ku dîtiye nexweşî ji sedemên fîzîkî û siruştî peyda dibin.
DOKTOR BEG, GAVA EZ DESTÊ XWE BI AGIR DIKIM, DESTÊ MIN DIŞEWITE. DIVÊ EZ ÇI BIKIM?
DESTÊ XWE NEDÊ
Dît ku fikir û his ne di dil de, di mêjî de çêdibin
LI GORÎ TIŞTÊ DOKTOR GOTÎ EZ NE DÎN IM. TENÊ GAVA EZ DIFIKIRIM EZ CIHEKÎ ŞAŞ BI KAR TÎNIM.
GAVA EZ DIFIKIRIM QÛNA XWE BI KAR TÎNIM. ÎCAR ŞERM E, MECBÛR BÊDENG DIFIKIRIM.


Em dikarin bibêjin ku ew hekîmê pêşî yê sînornenas bû. Li Yûnanistana Berê û Anadolîyê geriya û gelek nexweşî derman kirin.
JI BO XWEDÊ, ÊDÎ HEQÊ TEDAWÎYÊ BI HÊKAN NEDIN MIN. KA EZ Ê BI EW QAS HÊKAN ÇI BIKIM?
XWE ACIZ MEKE DOKTOR BEG, VÊ CARÊ EZ Ê DEYNÊ XWE BI TEVAHÎ HEL BIKIM.
Li dawîya gerên xwe yên tibî vegeriya bajarê xwe ku lê hatî dinyayê Girava Kosê û dibistana pêşîn a tiba hişmend ava kir.
EZ VÎ WEK DERSA XWE YA DEWRÊ HILDIM MAMOSTE. GAVA BAŞ BÛ EZ Ê BÎNIM DEYNIM CIHÊ WÎ, DIBE?.
Li dibistana tibê ya ku ava kirî ji bo doktoran sonda bi navê wî tê zanîn dide xwendin. Rêgeza pêşî ya sondê; pêşî zerarê nedê.
HIMMM, DEMA TU TIRAŞ BÛY TE XWE XIST VÎ HALÎ, HE?..
QEYDÊN ME TIJÎ BÛN KURÊ MIN. LI KÊLEKA ME DIBISTANA FELSEFEYÊ VEBÛYE. TAM LI GORÎ TE...
Xebatên wî bûn pirtûk û zêdetirî du hezar sal di cîhana tibê de wek çavkanîyên bingehîn hatin xwendin.
MA TU ÇIMA FELSEFEYÊ DIXWÎNÎ? HERE JI XWE RE TIBÊ BIXWÎNE. MIROV TENÊ BI KITÊBEKÊ MEZÛN DIBE!
HIPOKRAT
Cara pêşîn Hîpokrat zatûre, epîlepsî, kansera pişikê, sîyanotîk û nexweşîyên dilî pênase kirin.
TEMAM TEMAM, DEV JÊ BERDE... ÊDÎ NE HEWCE KU TU NAVEKÎ LI NEXWEŞÎYA MIN BIKÎ!
ÇI NAV LÊ BIKIM, ÇI NAV LÊ BIKIM?... EM BIBÊJIIIN... EWK... ÊÊÊ!...
Li gorî Hîpokrat sedema para mezin a nexweşîyên me ji ber tiştên ku em wan dixwin çêdibin
XEBERA TE YE MAMOSTA. XWEDÎYÊ LOQENTE JI ŞÎKAYETÊN MIN ACIZ BÛ Û...
...Û DI SALA 370AN A BERÎ ZAYÎNÊ DE LI BAJARÊ LARÎSSAYÊ HÎPOKRAT KU ÇÛ REHMETÊ...
KA EZ XWE LI XEWÊ DEYNIM. BELKÎ EZ JI VÎ XELAS BIBIM
XELAS

Mam Cici nivîsî



# QEHREMAN LÊ NETEWEPERWER



## 1921-1950: hesp, çek, jin...

Ji ber ku tu rojname û kovarên rastgir nediket mala me, ez dibêjim qey di nîveka salên 70yî de rastî van cure lehengên xêzkirî hatim. Têkilîya min a pêşî, ez bawer im li Çewlikê, li ser kaseyeke fêkîyan ku xêzeromanên xwendî lê dihatin firotin, bi kovara “Karaoğlan”ê bû. Belkî jî beşa Kara Murat bû, ku li ser rûpelekî rojnameyê ya avêtibûn erdê û min li ser pêyan hewl dabû bixwînim. Dibe ku çîrokeke Tengiz a kovara “Tercüman Çocuk”ê bû ku min bi cîranê xwe re pevguhartibû û ew xwendibû. Nayê bîra min ku min bê cara pêşî kîjan lehengê bişûr nas kir, lê ez emîn im ku wî pêşî gawirê xayîn û zalim dikuşt û paşê jî hêza xwe ya din a raser a tirk nîşanî jina ciwan û bedew a gawir dida.
Wê demê di her rojnameyên rastgir de qehremanekî şûrbaz ê xêzkirî yê tirk hebû. Di rojnameya Cumhuriyetê de ku em difikirîn ew çepgir e û ji ber wê diket mala me, lehengekî xêzeromanê hebû ku bi xêzên xwe, bi karakterên xwe û bi zimanê ku bi kar dianî, ji wan qehremanên din gelekî cuda bû; Abdulcanbaz. Ew Abdulcanbaza ku min gelekî jê hez dikir û bi dilgermî dixwend jî neteweperwerîyeke din bû, lê min ê ev yek ancax piştî salan fam bikira. Ev mijara nivîseke din e, lê belê ez îtiraf dikim ku tevî ew bêçek bû jî lehengekî min ê neteweperwer hebû.

Ji xeynî Abdulcanbaz, ku pêşî Azîz Nesîn çîrokên wî dinivîsîn û paşê Turhan Selçuk ew nivîsî û xêz dikirin, min li tu qehremanê neteweperwer taqîb nekir. Xêzeromanên neteweperwer jî tenê gava ez li wan rast dihatim min ew dixwendin, lê ew ji min re bûn cureyekî wisan ku min gava ew dixwendin qet kelecanek bi min re çênedikirin û zewq nedidan min.
Ez zarokê malekê wisan bûm ku kirmanckî lê dihat axaftin û beytên elewîyan lê dihat guhdarîkirin; îcar di nav wan pirtûk, rojname û kovaran de ku min ew dixwendin tiştekî aîdê mala me tune bû. Wekî din, ji bo min ne mimkin bû ku ez ji wan lehengên xêzeromanan hez bikim ku tê de her kesê ne tirk û ne misilman dihat cezakirin. Hemaseta di wan xêzeromanan de qet tesîr li min nedikir, ji ber ku hişmendîya nasnameyê ya ku di temenê gelekî biçûk de bi min re çêbûbû, li reaksiyoneke dijberê wê dageriyabû. Ji bo zarokekî biçûk, ew çanda redkirî ya lê bibe nasname, barekî giran e. Ez dizanim ku ev ne tiştekî bisihet e, lê ji ber ku ez neketime xefika serdestîyê yan redkirina çandên cuda, ez di rewşa xwe ya niha de tu pirsgirêkê nabînim.

Azîz Nesîn, karakterê Abdulcanbaz wek rêberê tûrîstan ê dekbaz, hîlekar û jêhatî disêwirîne. Turhan Selçuk vî karakterê neyînî hildide dike kesekî xwedî karakterê bêqusûr ku di dewra osmanîyan de jiyaye. Abdulcanbaz êdî nûnerekî nasnameya tirkî ya raser e.




*Tevî ku min tu carî ji wan hez nekir jî, lê van cure lehengan di jîyana min de her hebûna xwe domandin. Tevî ku ew neketin nav mala me jî, li derve, li her derê bûn. Çanda populer tiştekî wisan e, te çi qasî xwe îzole kiribe jî, kîmyayeke wê heye ku ji cihekî serî dikişîne û xwe diçizirîne bin hişê te. Tevî ku min ev cure xêzeromanên tirkperwer dem bi dem xwendine û min li hemû adaptasyonên wan ên sînemayê temaşe kiriye jî, min dizanî ku ez ne ew qas jêhatî me ku li ser vê mijarê binivîsim. Ji ber vê yekê min pêşî hewl da ku bigihîjim dîjîtalên hemû weşanên Karaoglan, Tarkan, Malkoçoglu, Kara Murat, Tolga û lehengên wekî van û wan dîsa bixwînim. Paşê ez li roportajên ku bi nivîskar û xêzkarên vî cureyî re hatine kirin geriyam û ez rastî wê nivîsa Suat Yalaz hatim ku min got belê divê ez tam bi vê jêgirîyê dest pê bikim: Afirîner û xêzkarê Karaoglan Suat Yalaz, di qunciknivîsa xwe de, ya ku 15ê Nîsana 2017an di Oda TVyê de, piştî nasîna wî ya bi Prof. Dr. Yalçin Kuçuk re ku wî ew wekî "Rewşenbîrê tirk ê biqalpax" tarîf kiribû, van gotinên ku jê re hatine gotin vedibêje: "Di dîroka me ya Komarê de, mertebeya yekem a tirkperwerîyê Nîhal Atsiz e, mertebeya duyem Abdullah Ziya Kozanoglu ye... Mertebeya sêyem jî tu yî..."*




*Ev hevok rastîyeke ron û zelal datîne holê; sê navên herî bibandor di warê avakirina netewedewletê û berbelavîya tirkperwerîyê de hene ku didu ji wan navan jî nivîskar û xêzkarên xêzeromanan in... Ev çawa çêbû? Ji bo famkirina vê bipêşketinê hewce ye em hinekî vegerin serî û li salên ewil ên Komarê binêrin.*

***Sê mertebe û nasnameyek!***


*Hewce ye Komara nû, ku di rêya netewedewletbûnê de bi pêş de gavan diavêje, di nav xwe de nasnameyeke neteweyî biafirîne ku tenê neteweyek tê de hebe. Ji tûrikê berê yê ku ji osmanîyan maye û gelek çandên etnîkî û bawerî tê de bi hev re bûne, tirkîtî jê tê kişandin. Ji bo ku civak hemû vê nasnameya neteweyî ya derketî qebûl bike, xebat tên destpêkirin. Ji bo ji kûrahîya dîrokê esîlbûnê*



**Tevî bi du mîhan hatibûn Anadolîyê jî, nedifikirîn ku bi xwedîkirina heywanan debara xwe bikin.**

*derxin holê ku ev ji bo rojavayîbûn û modernîzebûnê pêwîst e, hinek zanyar tên wezîfedarkirin. Pêşî xebatên Antropolog Şevket Azîz Kansu derdixin pêş ku wî îdîa dikir bastûra qoqên serê tirkan taybetmend in û heta bi awayê qoqên serê hîtîtan re eynî ne. Paşê li pey hev komedyenên din, biborin zanyarên din, derdikevin ser sehneyê. Prof. Dr. Afet Înan qoqê serê 64.000 kesî dipîve û îdîa dike ku tirk ne ji nijada çavdûçikî û zer, belkî ji nijada ewropî ne. Li gor Afet Înan, sumerî bi xwe jî pismamên tirkan in ku ew civaka herî medenî ya ji şaristanîya bi esil û kok a Mezopotamyayê ne. Paşê ev xanim ramanên xwe yên jîrane di xebatên Sazîya Dîroka Tirkan û di nivîsîna pirtûkên dersê yên lîseyê de par dike. Piştî van hemû xebatan, Teorîya Zimanê Rojê (Güneş Dil Teorisi) a navdar derdikeve holê. Li gor vê teorîyê, mirovan ewilî roj wekî çavkanîya jîyanê dîtiye, bi*

**Qoq û roj jî tê de, li gor van her sê hevalan, her tiştên ku ew dibînin di wan de li şopên tirkan digerin û koka hemû ziman û çandan jî tirk e.**




**Ew sê kes bûn, sê lêkolerên dîn, Afet, Şevket û Muazzez**

*mana û dengên ku dane, wan ziman çêkiriye, loma zimanê pêşî yê mirovahîyê jî bûye tirkî. Ji bo destekdana vê mijarê, ji alîyê Mustafa Kemal ve wezîfedarîyeke din a dawî jî tê kirin û Muazzez Îlmiye Çig Xanim ji bo îsbat bike zimanê tirkî û sumerî dişibin hev dest bi xebatan dike.*

*Qîma xwe bi wan xebatên zanistî naynin ku ew ji bo îsbat bikin neteweya herî resen a dîrokê ew in. Ji bo vê yekê pêwîstî bi wêjeya nivîskî yan devkî û lêkolînan heye. Romana nivîskarê fransî Léon Cahun a sala1896an a bi navê “La Bannière Bleue” (Gök Bayrak) tam jî vê pêwîstiyê pêk tîne. Romana “Gök Bayrak” romanek e ku vedibêje bê ka tirkbûna berî îslamiyetê çi qas mezin û pak e. Bi vê romanê re neteweperwerîya tirk a ku nû derketibû holê, berê xwe bi alîyê Asyaya Navîn ve dizivirîne. Ev pirtûk ji bo kesên wekî Ziya Gokalp ê nivîskarê pirtûka “Türkçülüğün Esasları” (Bingeha Tirkîtîyê) û Nîhal Atsiz ku dîsa ji damezirînerên neteweperwerîya tirkî tê hesibandin, dibe çavkanîya bingehîn ku wan jê sûd wergirtiye.*




***Çima hatina tirkan bi awayekî dostane nayê resmandin? Bi Dana silavan jî dikaribûn bihatina.***

*Bi gotina Yalçin Kuçuk, merheleya yekem a tirkkîtîyê çêbûbû. Abdullah Ziya Kozanoglu ku navê wî ji aliyê Kuçuk ve ji bo mertebeya duyem hatibû gotin jî, pêşî bi romana xwe ya bi navê “Kızıltuğ” ku di sala 1927an de nivîsî û paşê jî bi senaryoyên xêzeromanan, tevî vê têkoşînê dibe. Bingeha tîpên qehremanên tirk bi romana “Kızıltuğ” tê danîn ku tesîra wan heta roja îro dewam dike.*

*Heta nîveka salên çilî, cih nedidan xebatên ku pesnê osmanîyan didan. Di vê dewrê de romantîzm û bilindkirina Asyaya Navîn gelekî di rewacê de bû. Abdullah Ziya Kozanoglu lehengê herî bibandor ê xêzeromana neteweperwer a tirk, Akbulut Kaan dinivîse. Suat Yalaz,  ku Yalçin Kuçuk jê re dibêje "merteba sêyem jî tu yî" jî wê diresimîne. Paşê xêzeromana Akbulut Kaan ji alîyê Suat Yalaz ve bi tenê tê nivîsîn û xêzkirin. Pêşî bi navê Kaan û paşê jî bi navê “Karaoğlan” jî dê bê çapkirin.*

*Sê mertebe jî temam bûne. Êdî xwendekarên xêzeromanan hene ku di dîroka xwe de ji şanazîyê pê ve cih nadin tu hestî û her kesê ku vê şanazîyê par nake, wan ji xwe re wekî dijminan dibînin.*




***Bingeha tîpolojîya mêrê tirk ê bihesp, bişûr û bijin ê di xêzeromana tirkan de, bi vê romanê tê danîn***




*Di nav kovarên zarokan ên wê dewrê de, ez bergê hejmara 42an a kovara “Ateş - Çocuklar İçin” (Agir - Ji bo Zarokan) gelekî balkêş dibînim. Tenê li ser vê bergê, dibe ku bi sedan rûpel tez bên nivîsîn. Li ser bergê em pîlota jin Sabîha Gokçen dibînin ku destê ‘Ata’yê xwe radimûse. Hema li pişt Gokçenê balafira ku lê siwar bûye û li ser wê jî cilên pîlotîyê hene. Gava em dîroka 9ê Tebaxa 1937an a kovarê dibînin, em bi tirs vediciniqin. Ev berg di wê demê de hatibû xêzkirin ku Komkujîya Dêrsimê, ku bêyî bibêjin ev zarok e, ev mezin e, tê de bi hezaran mirov dihatin qirkirin, hîn dewam dikir. Wekî ku em hinekî din bi baldarî lê binêrin, em ê bikarin toza piştî bombekirinê ya li ser cilên Sabîha Xanimê jî bibînin. Manaya vê bergê ji wê dîrokê diyar e ku tê de hatiye weşandin; ev kovar ji bo wan zarokan e ku bi tirkbûna xwe şanazîyê dikin. Ji xwe tiştê ku dikeve para zarokên din jî aşkera ye.*



Logoya Kovara “Gürbüz Türk Çocuğu” (zarokê Tirk ê Tixis), ku ji hêla Sazîya Hêvişandina Zarokan ve hatiye weşandin. Wisan dixuye ku qet hewcehîya wî bi hêvişandinê nîn e.

***Rêça neteweyî ya ku bi kovarên zarokan dest pê kir***

*Weşangerîya xêzeromana neteweweperwer a tirk berî ku di rojnameyan de bê weşandin, bi kovarên zarokan derfeta bipêşketin û belavîyê bi dest dixe. Dibe ku sedema xêzeromanan ji alîyê xwendakarên tirk ve demeke dirêj wek karê zarokan dihate dîtin jî, ev be.*

*Aşkera ye ku kovarên zarokan wek wan weşanan dihat dîtin ku tê de îdeolojî û nirxên Komarê dihatin hînkirin û bi mebesta afirandina nasnameya neteweyî dihatin bikaranîn. Bikaranîna xêzeroman û kovarên zarokan, di avakirina netewedewleta modern de wek amûrekî propagandayê mecbûrî bû, çinku weşanên herî populer ên wê serdemê ev weşan bûn.*

*Ziya Gokalp dibêje ku Destana “Oğuz Kağan”, çîrokên Dede Korkut yan jî wêjeya dewra Şerê Rizgarîyê, metnên bingehîn in ku nasnameya tirk li ser îdeala lehengîyê ava dikin. Xelkê Amedê Ziya Gokalp baş nas dike.*

*Di sala1926an de ji alîyê Sazîya Hêvişandina Zarokan a wê demê ve kovara “Gürbüz Türk Çocuğu” (Zarokên Tirk ên Tixis) dest bi weşanê dike. Di 1928an de kovara “Çocuk Sesi” (Dengê Zarokan), di 1934an de “Afacan” (Beleban), di 1939an de kovarên zarokan ên gelekî dewlemend ji bo xêzeromanê yên wekî 1001 Roman derdikevin. Kovara 1001 Roman di serî de weşaneke wisan bû ku bi tevahî ji xêzeromanên biyanî pêk dihat, lê di nav salan de cih da xêzkar û nivîskarên neteweperwer ên tirk jî. Di sala 1939an de kovara Afacan û Çocuk Sesi dibin yek û bi navê kovara Ateş (Çocuk) tê weşandin. Çocuk Haftası (Hefteya Zarokan) di 1943an de, Doğan Kardeş di 1946an de dest bi weşanê dikin. Ev dewr, ew sal in ku bêhtir cih didin xêzkarên tirk û qîmeta xêzeromana neteweperwer dihat zêdetirkirin.*

*Dema ku em digihîjin salên 1950yî, di xêzeromana neteweperwer de guherîneke balkêş çêdibe û xêzeromanên ku berê xwe dizivirin ser dewra osmanîyan derdikevin holê. Xêzeromana bi navê “Barbaros’un Son Seferi” (Sefera Dawî ya Barbaros) ku ji alîyê Ratip Tahir Burak ve hatibû xêzkirin, di rojnameya Hurriyetê de dest bi weşanê dike. Ev nîşana wê yekê bû ku êdî xêzeroman ji kovarên zarokan derbasî nav rûpelên rojnameyan dibin.*





*Ez ê di hejmara bê de jî, behsa xêzeromana tirk a neteweperwer bikim ku ji destpêka salên 1950yî heta roja îro populerbûna wê zêdetir bûye.*





Di kovarên zarokan ên dewra ewilî de, bi piranî cih didan xêzeromanên amerîkî. Di xêzeromanên tirk de, ku hejmara wan kêm e, bi awayekî giştî behsa qehremanên dîrokî tê kirin. Ji lew re li gor van kovaran, dîroka tirkan bi çîrokên qehremanîyê tijî ye ku divê şanazî bi wan bê kirin. Eger li rastê sehneyeke kuştinê hebe û karakterekî tirk beşdarî lê kiribe jî, ev qebeheta yê kuştî ye û heq kiriye. Xerabî û zeîfî jî, taybetmendîyên wisan in ku tenê bi miletên din re hene.


EW Ê BIDOME





# DEDEKTÎFÊ KUÇEYÊN TENG ZILKÎF

şêxmûs çîçek


MESELA ME JI HEJMARA DIDUYAN BERDEWAM DIKE
BIRAYÊ TE YÎ HEPSÎ ÇAWA YE QÎZA MIN? DI DESTÊ DEWLETA ZALIM DE...
XÊR E XALÊ ZILKÎF, MESELE ÇI YE? EZ ZANIM EV TIŞT TE PIR ELEQADAR NAKIN
LÊ LÊ DAYÊ ?!...
XALTÎYA ŞEHEEEM!... ZÛ XALTÎ, POLÊSAN AVÊT SER MALA BÊRÎTANA HEVALA MIN
BÊRÎTAN?!.. MALA ŞUKRIYÊ LÎÇEYÎ!...
JEHR TÊKEVÊ!... QAŞO MIN ZIYARETA WÊ MALÊ JÎ KIRIBÛ. AX ÛLA, AWA MIN NEDÎT, ÇAWA MIN ŞIBHE NEKIR!.. WÊ PÎREKÊ... PIR PROFESYONEL HEREKET KIR Û EZ DAWETÎ HUNDIR KIRIM.. EZ JÎ MÎNA AMATOREKÎ PÊ ÎQNA BÛM. TIFÛÛÛ!..
HAHO! MESELEYEK EW QAS MEZIN?!..
TU DIBÊJÎ QEY HEMÛ DEWLET LI VIR E. TANQ Û TOPÊN XWE GIŞT ANÎNE.
EZ JI BIN DERNEKETIM EV POLÊS ÇAWA JI BIN DERKETIN? QAŞO HEMÛ MEHELEYÊ NAS DIKIM, HER ROJ LI VIR IM Û AQIL Û TECRUBEYA MIN JÎ TÊRA XWE HEYE... HMMM!..
EV JÎ TÊ WÊ MANAYÊ KU LI MEHELEYA ME AJANÊN POLÊSAN KARÊN XWE BAŞ DIKIN Û EV KURDÇÎ JÎ GAVA LI AJANAN DIGERIN ÇAVÊN WAN TENÊ MIN DIBÎNIN. EHMEQÊN EHMEQ!...


NAVÊ ME DERKETIYE, NE? SALÊ DU-SÊ CARAN NEAVÊJIN SER MALA MIN DILÊ WE REHET NABE. BÊSÛC, BÊSEBEB...
XEBER JÎ DIDE HÎN... KA LI EREBEYÊ SIWAR BE TU
ÇI QEWIMÎ MIN FAM NEKIR. ÇAVKANÎYA ME SAXLEM BÛ QAŞO?..
VÊ ŞEVA HANÊ HA-TIN ZIRAVÊ GEDEYÊN MIN QETANDIN ÇI?!. SER Û BINÊ XANÎ LI HEV XISTIN. SÊ ROJAN PÊ MÎJÛL BIM DÎSA RAST NABE..
CEWABA MIN NEDE! EM Ê LI ŞUBEYÊ XEBER BIDIN...
BELKÎ MIXBÎRÊ TE XWAST PESNÊ XWE BIDE Û DEREWEK KIR Û TE JÎ BÊYÎ TEYÎD EM ANÎN VÊ DERÊ...
YA ÊDÎ ELIMÎNE Û BI AVÊTINA SER MALAN NATIRSIN. YAN JÎ... NE TIRS NE PANÎK; TU DIBÊJÎ QEY LI BENDA ME BÛN.
YAN JÎÎÎ!...
EHM, SAET ÇEND E YAW? NIZANIM MELE AZANA EŞAYÊ DA YAN NA? JIXWE DENG NAYÊ GUHÊ MIN...
KA WÎ EXTIYARÎ BÎNIN BA MIN. DIHERIM KU DERÊ EV ZLAM LI WIR E..
Ç..ÇAWA! KÎ?... B..BANA DÎYOR QOMÛTANIM ?!..
ÇI QOMTAN ÛLAN! KA BERSIVA AMÎRÊ MIN BIDE. ÇI ÎŞÊ TE LI VIR E?
EHM, BEN TIRÇE BÎLMÎYOR. FAM DIKIM LÊ XEBERDANA MIN...
KÜLLAHLI! KA WERE EM ÎFADEYA TE BIGIRIN
EV DEREW 50 SAL BERÊ QÎMETA WÊ HEBÛ ÛLAN!



ZALIMÊN ZALIM! WEXTA FÎŞÊ MIN Ê PAK Û PAKIJ Ê EDLÎ BIGIHÎJE DESTÊ WE, HÛN Ê FEDÎ BIKIN JI MIEMELEYÊN XWE.
HEQÊ TE, TE BIBIM ŞUBEYÊ Û ÇEND ROJAN LI WIR BIDIM RAZAN, LÊ... SIKTIR BE HERE MALA XWE KALO.
BU NE BİÇİM MUAMELEDIR. WALİYE ÇIQACAXAM. DİYECEGEM POLESIMIZ BANA BOLE BOLE YAPTİ
SERBEST MA, CESARET Û TIRKIYA WÎ JÎ HAT CIH.
EW QAS SAL MIN XWE JI KURDÇIYAN DÛR XIST, EW QAS ZEMAN MIN RAYA XWE DA MISILMANAN, JI BO ÇI!... JI BO KU VAN TIŞTAN BÎNIN SERÊ MIN?..
AMCA, KÜLAHIN...
KUMIKÊ MIN JÎ NE 'KULLAH' E... QEŞMER! KUMIKÊ MISILMANAN E... Û BELÎ YE KU WE ZÊDE LI HECÎWAT-QARAGOZ GUDARÎ KIRIYE DÎ GEDETÎYA XWE DE
HA-HOOO! MA MILET QEY BELASEBE BERÊ XWE DIDE VAN KURDÇIYAN!... ÇI QAS BAŞ BÎ JÎ DAWÎYA DAWÎ ME GIŞTAN XAYÎN DIBÎNIN, NE!...
JI NIHA BI ŞÛN DE JI KURDÇIYAN RE TU GOTINÊN MIN NEMAN.. NE EZ DIKIM NE DIHÊLIM GEDÊ MIN BIKIN. EW QAS SAL PEY KETIM JI BO NEKEVIN TORA VAN KURDÊN SIYASÎ. JI ÎRO BI ŞÛN DE EZ Ê BIBÊJIM ÊDÎ HÛN SERBEST IN..
MADEM DEWLET QÎMETA ME NIZANE JI BO ÇI SERÊ XWE BÊŞÎNIM Û VAN CÎRANAN BIKIM DIJMINÊ XWE... KU CAREKE DIN HERIM NEWROZÊ, EZ Ê NE TENÊ JI BO MERAQ Û KONTROLÊ HERIM. EZ Ê HERIM ÇIMKÎ EZ KURD IM!
REQ! REQ!
WÎ BAVO, EV ÇI HALÊ TE YÊ?! ÇI BI SERÊ TE HAT?
ZALIMÊN ZALIM!.. XWEDÊ HEQÊ ME JI WAN RE NEHÊLE...



OY BAVO KA HELA BISEKINE. KA HELA...
WA JI TE RE DIBÊJIM; EV TIRK JI ME RE NABIN... NE JI BAŞÎYÊ FAM DIKIN NE JI MISILMANÎYÊ. JI NIHA BI ŞÛN DE...
EV MONT?! PER.. PERDEYÊN KIŞANDÎ, ?!..
OY BISMÎLA!...
SELAMUNELEYKUM KALO. HEBEKÎ DERENG E, LÊ EM JI OTOBOSA XWE MAN.
WELHASIL XUYA YE KU EV ÇEND ŞEV EM Ê BIBIN MEVANÊN WE.
XORT.. MÊVAN.. L..LI DERVE QIYAMET... EZ Ê!.. EM!..
E...ERÊ! XWE..XWEDÊ BELA MIN DIDE..
ÇAWA KALO? MIN FAM NEKIR..
OPERASYON BERHEWA ÇÛ... LÊ TESELÎYA DEWLETÊ KET YA?... BELKÎ JÎ BÊHTIR HAR BÛN.. ECÊB AJANÊ MEHELEYÊ KÎ YE? MALÊN HIZBULAHÇÎYAN?...
MEHEME, KA RAPORA XWE HETA VÊ SAETÊ BIDE; ÎRO TIŞTEKÎ ECÊB, TIŞTEKÎ NE NORMAL QEWIMÎ YA NA? EW POLÊS YAN JÎ MERIVÊN XERÎB LI VAN DERAN XUYA BÛN GELO? EZ TENÊ NIKARIM LI HER DERÎ BIM, ZANÎ? LOMA LAZIM E TU JÎ ALÎ MIN BIKÎ. MESELA ÎRO KES BALA TE KIŞAND? CÎRANEK BI PIRSÊN LI SER MESELEYA DO, YAN NASEKÎ KU WEK SIHBET LI BIN ZIMANÊ TE BIGERE FILAN??... TIŞTÊN KU JI BO TE BIÇÛK Û BÊMANA BE JÎ BIBÊJE. NIHA JI BO MIN HER TIŞT MIHÎM E. PIR PIR PIR MIHÎM...
HAHO XALÊ ZILKÎF, POLÊSÊN DO JÎ TU NESEKINANDÎ, NE? EV MERAQA TE WÊ ROJEKÊ SERÊ TE TAM BIXWE, LÊ XWEDÊ ZANE KENGÊ!
XELAS





# XÊZ-ARŞÎV





TIRŞIK
EŞREF MUMCU
ELOO! DESTÛRÊ BIDIN EM WESTIYAN ÊDÎ! 3 SAET E EM LI JOR IN
3 ROJ E TU LI KU BÎ BIFETILE HERE WIR DÎSA. EZ ÊDÎ NE JINA TE ME. EZ Ê TE BERDIM KURÊ ŞEYTANOKA.
DELALIYA MIN, DI MIDYEYA TE DE GUSTÎLK DERKET. TÊ BI MIN RE BIZEWICÎ?
DAXWAZA ZEWACÊ YA MÎDYECIYÊN MÊRDÎNÎ JÎ WIHA YE DÊMEK, ERÊ ERÊ EZ Ê BIZEWICIM
KURO TE BI EŞQA MIN XWE PERITAND SALIHO LO, AGIR BI TE KETIYE!
ÇI EŞQ WEHŞÊÊ, ÇI EŞQ EZ ŞEWITÎM BÛM XWELIYA AGIR. ZÛ SITÎLEK AV BIRÊJE SER MIN ZÛÛÛ!... EZ MIRIM ÛÛÛ!...
KURO HESO EZ JI KÊ RA DIDÊJIM, DENG JI QÛNA TE TÊ
KEÇÊ EYB E WISA NEBÊJE ÛÛ!
EZ BÊJIM EYB E TU BI QÛNA XWE BÊJÎ NE EYB E? QEDA LI TE KEVE
KEÇÊ JINÊ EV ÇI DENG BÛ? HIII? GELO MAYIN E EV?
MIN DEH ZAROK ANÎN DINYAYÊ, ÊDÎ BES E WELLE. ÎLACA BIHEMLEBÛNÊ JÎ TU NASTÎNÎ. WELLE BES E. TU LINGÊ XWE HILÎNÎ TÊ BITEQÎ. ÊDÎ GUNÊ MIN BI TE NAYÊ
ŞILEQ
ÎCA ZAHIDO TE EZ XAPAN DIM. TE GO EREBEYA MIN HEYE. EREBEYA TE EV BÛ?
EV EREBEYA MIN A BAXÇÊ HEWSELÊ YE, PÊ EREQÊ DIKIŞÎNIM. DENGÊ XWE NEKE
HECÎ SALIH HECÎ SALIH TU ÇIMA XWE VEDIŞÊRÎ? KURO DEYNÊ XWE ÇIMA NADÎ? 2 SAL E LI BENDA TE ME
AXXX LI MIN DAYÊÊ MAR EZ XWARIM EZ DÎSA JI TE XELAS NEBÛM. HEYRA MARO MIN TÊR BIXWE EZ ÊDÎ JI VÎ QEŞMERÎ XELAS BIBIM
TE MÊZE DIKIM KEFA MIN TE
HAHOO! BAVÊ HESEN TELEFONA WÎ JÊ STANDIYE DÊMEK, ÊDÎ DERD Û KULÊN XWE LI ÇIYAYAN DINIVÎSE, PEHE EMOJÎ JÎ HEYE


GOOOL!
MEHKÛMO
ÇEP! ÇEP!
GOLEKE SUPER!.. HEVALÊN C-5'Ê ECÊB PROFESYONEL DILEYÎZIN YAW. TU DIBÊ QEY LI DERVE NE. BRAVO!..
HEVAL VA YE SÊ SAL E KETIYE ZINDANÊ LÊ HÊ JÎ NE MÛYEK PORÊ WÎ SPÎ BÛYE NE JÎ DIWEŞE. TU DIBÊ QEY JI XWE RE HATIYE PÎKNÎGÊ
BELÎ YE KU NIKARE JI SURECA ZINDANÊ FÊM BIKE. HEVALÊ LAY LAY LOM!..
MERIV LI BER KURDISTANÊ NEKEVE JÎ LI BER DIYA XWE DIKEVE, NE? HEVALÊ QAYGISIZ!..
EHM, HEVAL RAST DIBÊJIN. EEE!.. EZ JÎ XWE REXNE DIKIM. ÎNŞELLE WÊ BI ALÎKARIYA HEVALAN ROJEKÊ PORÊ MIN JÎ...
ŞUPE DIKIM KU AJAN BE. HIM PORÊ WÎ HIM JÎ NIYETA WÎ REŞ!...
PIŞTÎ 20 DEQÎQE...
...DI SERÎ DE, BI KURTASÎ DIKARIM BÊJIM KU ROJHILATA NAVÎN DI ŞER DE YE...
PIŞTÎ 50 DEQÎQE...
BERÎ ÇEND GOTINÊN DAWÎ DIXWAZIM DÎSA BIBÊJIM...
PIŞTÎ 85 DEQÎQE...
EZ NAXWAZIM GOTINÊ DIRÊJ BI KIM, LÊ WEKÎ HÛN JÎ DIZANIN...
PIŞTÎ XWEDÊ ZANE ÇEND DEQÎQE...
REQ!
HEYOOO!.. QURBANA XWEDAYÊ XWE BIM..
HER BIJÎ!...
TI-LÎ-LÎ LÎ!...
FIRAAR! AMÎRÊ MIN FIRAR DIKIIIN!..
GARDIYANÊN ALÇAX!... SÎSTEMA DIJMINÊ KITÊB Û ÇANDÊ!..
HEVALÊ MIHYEDÎN!.. HÎNBÛNA ZIMANÊ KURDÎ ÇAWA DIÇE?.. HEVAAAL!..
XWRRRRR
XWQ
TE GO ÇI; 'SAYIMA' ŞIPYAKÎ?... DIJMINÊ BÊNAMÛSÊ HERAM!..
CIIIZT!
BÎST SAL E DI NAV BETON Û PLASTÎKÊ DE YE. ÊDÎ DIKARE ELEKTRÎGA DER DORÊ KONTROL BIKE. CERYAN MA. JI VANA DÛR BISEKINE.


DIBÊJIN;
HÊJ DEMA NAVÊ VAN ÇIYAYAN TUNE BÛ LI SER LÛTKEYA WÊ XWEDA HEBÛNE Û HERÎ XWEŞIK ROJ LI SER VÎ ÇIYAYÎ HILHATIYE. LI GORÎ GOTINÊN GOTINBÊJAN ROJEKÊ ROJ WISA XWEŞIK HILHATIYE KU XWEDA JÎ WÊ DEMÊ HEMA DI CIHÊ XWEDE REQ BÛNE Û BÛNE KEVIR.
DÎSA DIBÊJIN;
ROJ BI HEZARAN SALAN E JI BO XATIRÊ VAN DOSTÊN XWE YÊN QEDÎM HILTÊ.
EZ NIZANIM, MEZINAN WISA GOTIYE, RAST AN DEREW JI WAN BI ME MAYE...
HIN KES JÎ DIBÊJIN DI DEM Û DEWRANÊN QEDÎM DE QRALÊ KOMAGENEYÊ ANTIOCHOSÊ I'EMÎN LI VIR JIYAYE Û BI NAVÊ NEMIRIYÊ EV PEYKER ÇÊKIRINE Û PÊ RE JÎ YÊ XWE. HER WEKÎ KU BI NAVDARÊN WÊ DEMÊ RE SELFIYEK KIŞANDIBE...
BELKÎ EV JÎ VIR Û DEREWÊN HIN KESÊN DIN BIN..
ZAROKÊN NEMRÛD
MAM CÎCÎ
KÎJAN RAST E NIZANIM.
LÊ BELÊ EZ BAŞ PÊ DIZANIM KU JI DEMA ROJ DERDIKEVE Û HETA DIÇE AVA, EV XWEDA QET HUŞ NABIN. HEKE HÛN JÎ HINEKÎ XWE LÊ NÊZ BIKIN Û GUHÊ XWE BIDINÊ, JIXWE HÛN Ê JÎ BIBIHÎZIN VAN XWEDAYÊN ŞAHIDÊN HEZAR SALAN ÊN ZIMANDIRÊJ..
HUŞŞ, DESTÊ XWE DAXE, ÎCA EZ Ê VÎ DARÎ LI SERÊ TE XIM HAA.
HEVALINO RABIN, ROJ DERDIKEVE, HÛN JÊ DIMÎNIN
WISA NEBÊJE ABÊ. KA TU BI XWEDÊ DÎMENEKE WIHA LI KU HEYE?
KA BISE. WEKÎ TURÎSTÊN NÛHATÎ NEQÎRE LO! MA EV HEZAR SAL E EM EYNÎ TIŞTÎ DIBÎNIN TIRRÊÊ!
MALA MINÊ QEY TE CIHEKÎ DIN DÎTIYE?
BÎLO KURO TU ÇIMA WISA TEWŞO-MEWŞO DINÊRÎ?
HEVRÊNO, DINYA RONÎ BÛ! EM DÎQATÊ LI DISÎPLÎNA XWE BIKIN, BI HEREKETAN EM DEST PÊ DIKIN, YEK.. DU, YEK.. DU..
NIZA BI ŞEV ÇAWA RAKETIME, NIKARIM STUYÊ XWE BIZIVIRÎ-NIM WELLE
EHE HE! TU ÇITO MIROV Î LAWO
BES E WÎÎ! WEKÎ KURDÊN POLÊSÊN KUBAR DÎ-TINE XWE ŞAŞ NEKE ÊDÎ.
HUŞŞ, EHHE EHHE!.. TE GO STÛYÊ MIN REQ BÛYE YA, PÊKENOKEK HATE BÎRA MIN BINÊ..
RAWESTIN, DÊ HENEKEKÊ BIKE!
KA BÊ DENG BIN PÎÎÎ. PÊKENO-KA ÇI VÊ SIBE ZÛYÊ? SERÊ MIN ÊŞIYA LÊ HÛN HÊ JÎ LEQELEQÊ DIKIN
WEY EZ DI AQILÊ TE DA..


LI DEREKÊ PÊŞBAZIYA AVJENIYÊ DIKIN. MÊRIKEK TÊ, DI DEST DE ÇENTEYEK, DIBÊJE DÊ KEKÊ MIHÊ JÎ BIKEVE PÊŞBAZIYÊ. DIBÊJIN KURO KEKÊ MIHÊ KÎ YE.
ÎCAR ÇENTE VEDIKE, DI ÇENTE DE TENÊ SERIYEK HEYE. DIBÊJIN KURO EV E KEKÊ MIHÊ? MA EV DÊ AVJENIYÊ BIKE? TU TINAZÊN XWE BI ME DIKÎ? MÊRIK JÎ DIBÊJE NA HEYRAN Û PESNÊ KEKÊ MIHÊ DIDE. ÎCAR EW JÎ DIBÊJIN TEMAM BILA EW JÎ WERE
DEMA PÊŞBAZÎ DEST PÊ DIKE, WÎSERÎ DIAVÊJIN NAV AVÊ. KEKÊ MIHÊ DÎREK DIKEVE BINÊ AVÊ TABÎ. DISEKININ DISEKININ LÊ JI CIH NALIQE. HEMA WISA DIMÎNE. XWE DIAVÊJIN AVÊ, SERÎ DERDIXIN. Ê KA ÇI BÛ, KA TE PIR BAŞ AVJENÎ DIKIR?
MIHÊ HÊDÎKA SERÊ XWE RADIKE, DIBÊJE KRAMP KETE SERÊ MIN ABÊ. EHHE EHHE, TISSS, TISSS!
SERÎ ÇAVA SERÎ RADIKE KURO? AHAHH HHH..
AHHAHHHA, PIR KOMÎK E WELLE
DEV JI VAN GOTINÊN LUMPEN BERDIN HEVALINO. EM HENEKAN BIKIN LÊ ÛSLÛBA XWE JÎ XIRA NEKIN.
HUŞŞ, HUŞ BIN, TÊN, TÊN!
MA BILA EW JÎ HER ROJ NEYÊN KAKO, EM JÎ HINEKÎ BÊHNA XWE BIDIN, NE WISA?
KA HÛN DU DEQAN BÊ DENG BÛN MA?
OO! WONDERFULL!
OOO!! EXCILLENT!..
OH MY GOD!
OLA LA LA!
ÎMPASIBIL!
OLA LA LA!
HIRRRX!...
HSŞŞŞ, VA YE HATIN, DENG NEKIN
TIFÛÛÛ!...
KURROO!..
PÛTPEREST, KAFIR, ZINDIQ WELLEH EZ Ê RÛXÎNIM, HILWEŞÎNIM HAAA!..
KURO TU KÊ HILDIWEŞÎNÎ, ZIRTOYÊ BÊÎMAN!
GIRM!
UFFF!


HELA LI BÊNAMÛSÊ DAIŞ'Î BINÊRE
OXWEŞ, DESTÊN TE NEÊŞIN KEKO
XWEZÎ TE LI CEM TURÎSTAN WIHA NEKIRA, BINÊRE REVIYAN ÇÛN
TE NEGOT BI KÊRÎ TIŞTEKÎ TÊN? ME ÇI FEYDA WAN DÎT? ÎCAR WANDERFOL, ÎCAR PORFEKT
HÎEAAAA!
WISA NEBÊJE KEKO, CARINAN EW JÎ XWEŞIK IN. PIFF. PIFF!
HŞŞŞ, EW ÇI YE, TE EW CIGARE LI KU PEYDA KIR?
CIGARE NÎN E, PÛRO YE MMPPPHH. EW TURÎSTÊ ALMAN XIST. MMPPHHH!
MA HEMÛYÊ TU YÊ BIKÊŞÎ BÊŞEREF. KA GURMEKÊ JÎ BIDE MIN!
EM LI HEV PARVE BIKIN, HEMA TENÊ JI XWE RE NA
EZ CIGARE KIŞANDINA WE ERÊ NAKIM HEVALINO. KÊMASIYÊN WIHA LI ME NAYÊN, HEM JI BO TENDURISTIYÊ JÎ..
ABÊ DEV JI WÊ TENDURISTIYÊ BERDE. MA DÊ ZIRARÊ BIDE ÇERMÊ ME? AHHHAHHHA..
AHAHH, HAHHAA..
BER BI AVABÛNA ROJÊ VE...
OOO, DIÇE AVA, DIÇE AVA
OHHOO, OHHHO.
DÎSA DIQÎRE HAA! JI TE RE ÇI KURO? TE XÊR E WEKÎ QAMÊŞAN DIORÎ!
DEV JÊ BERDE BILA AVA BIBE, YAN EW DÊ AVA BIBE YAN EM.
WAA, TE ÇI GOTINEK MEZIN KIR MAMO..
MIROV NIKARE JI BILÎ VIR LI CIHEKÎ DIN BIJÎ WELLE.
QUZZILQURT. DEMA TE DIKIŞAND TE WISA NEDIKIR TABÎÎ!
ÊDÎ DEMA BÊDENGBÛNÊ YE. AGIRÊ MUHABBETÊ KU BI DERKETINA ROJÊ HILBÛ, BI AVABÛNA ROJÊ RE DITEMIRE. LÊ PIZOT ŞERT E DA KU SERÊ SIBÊ DÎSA AGIRÊ MUHABBETÊ VÊKEVE




Xwedîya îmtiyazê / İmtiyaz Sahibi: Li ser navê Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê / Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi Adına Zeynep Yaş Salam
Karên Nivîsaran û Xwedîyê îmtiyazê / Yazı İşleri ve İntiyaz Şahibi: Tahir Baykuşak
Edîtor: Doğan Güzel
Wergerê Kurmancî: Omer Dilsoz, Redaksiyon: Zana Farqînî
Adres: Yenişehir Mah. İstasyon Cad. No 65 Yenişehir/Diyarbakır